

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar ( 119 ) | Sal 21 | Avdar | 2016z - 2628k | Buha (50)L.S


# Rikberiya Sûrî ! ... Çima Vir Û Sixêf ?!

**Rozad Elî / Desteya sernivîser**

Piştî ku pirojeya Ferderaliya Roava-Bakurê Sûryê ji hêla hin alî û partiyên kurdî û kesayetîne ji pêkhateyên Bakurê Sûryê ve hate ragihandin, helwestên ren-gereng û bêhinteng ji hin karbidest û pey-vdarên sazûmana sûrî û rikberiya sûrî ya siyasî de derketin. Hin ji wan gotinan dûrî sinciyê bûn, daketin astên pir kêm û nizim, û hîç ne li gora bejnûbala siyaset-medarên dewletan bûn!.

Bi rastî jî, çend gotin û helwestên pir tûj û balkêş di dermafê gelê Kurd de hatin kirin, wan gotinan û xwedanên wan, ne tenê mirovê Kurd êşandin, wan bala dostên wî jî kişand ser rastiya helwesta nijadperestiya erebî!.

Mirov dipirse, çi sûde ji gelê Sûryê re di nizimkirina kesayeta mirovê Kurd û civaka kurdî de heye, daku ew bê şerm, bê ku li ber xwe bikevin, ji dîrokê jî fedî nekin, û rabin çel milyon Kurd wek boyekerên solan û berdestên xwaringeh û çayxanan salix bidin?! Û çi sûde ji paşeroja (şoreşa rikberiya) sûrî re heye jî, ku dîrok, xaknîgarî û hemî rastiyên ku li ser zemînê hene, nebînin û binpê bikin?! Ew çawa kanin bêjin, ku tenê çend hezar Kurd li Sûryê hene, ew jî li deverên Sûryê belavkirî ne, û piştî damezrandina dewleta Sûryê ji serxetê (Kurdistana Tirkiyê) darbas Sûryê bûne, lewre jî, ew ne xwedî xak û mafên netewî ne?!. ..... 2




## Fedralî Çareya Serê Sûriyê ye!

**Mihemed Qere Hesen**

Di vê qonaqê de, piştî şeş-heft mehan ji xwepêşandanan, şoreş bi ser neket û rijîmê jî bi destên hesinî li miletê sîvîl xist û heroj pakrewan pir dibûn. Vê tentêlê[rews] hêşt ku şepêla Îslamî doza çekirina şoreşê bike, û gelek dewletên herêmê jî dest derbase hundirê Sûriyê kirin, û bi wê yekê, hino hino rewşa welêt herimî, pevçûnên leşkerî hatin kirin û kujkariyên mezin li dar ketin. ……….. 3

---

Dîroka gundekî

## Gundê Şêtika

Vî gundî navê xwe ji girikê Şêtika yê di nava gund de ye biriye, her weha girik jî ji giyayê (Çîtikê) ya bilind ku di çemê di rojhilta gund re diherikî wergirtiye. Gundê Şêtika di navbera /1900-1903an/ de, ji hêla hoza Hemka de hatiye avakirin.

Di sala 1960î de, ji encama Xeta dehan, ango projeya (Zinara Erebî) ya nijadperest, û bi mebesta Erebikrina herêma Kurdî, navê gundê (Şêtika) kirine (El Yememe). 5

## Komcivîna Mamoste M. Şêx Allî li Efrînê.



Bi boneya Cejna Newroza pîroz, li roja 18 meha Avdarê, sekretêrê Partiya me P.Yekît ya Demokrat a Kurd li Sûryê berêz Mihidîn Şêx Allî, li bajarê Efrînê li komcivînek siyasî beşdar bû. Kovcivîn li ser vexwandina rêxistina partiyê hat lidarxist. Bi dehan kesayetiyên civakî, rewşenbîr, xwedan pêşe û siyasetmedar lê amade bûn.

Piştî bixêrhatinê, rêzdar M.Şêx Allî bi ferehî li ser rewşa Sûryê û gelê sûrî û qeyrana ku tê re derbas dibe axivî, û şiroveyên zelal û berfereh diyar kirin. Ew bi ferehî li ber pirsa gelê Kurd li Sûryê û rewşa tevgera wî ya siyasî jî rawestî, û helwesta partiya xwe ji pirsa pirojeya federaliyê li Sûryê, û bertekên رد فعل neyînî ku ji gelek aliyan de hatine jî ravekir. Li dawiya axaftina xwe, rêzdar Şîx Allî bersiva gelek pirsên beşdaran bi rengekî berfere da û spasiya wan kir.

Bi tevahî, gotin, şiroveyên mamoste Şêx Allî û helwestên partiya Yekîtî ciyê vehesa beşdaran bû. Û hêvî û daxwaza wan ew bû, ku komcivînên wiha herdem ji hêla rêzdar Şêx Allî û berpirsên hemî partiyan ve werin kirin.

---

### Rikberiya Sûrî! … Dûmahîk

Ji bo van virûvûtên erzan, ku ji devê hin kesên erzan derdikevin, û belkî hîn jî werin gotin, pir pêwîst nake, ku eger her yek gotin kir tu kevirekî bavêjê! Çinkî, jerkî ku Sûryê wek dewlet hatiye binavkirin, û em jî di nav sînorên wê de bûne welatî, dîroka gelê Kurd li Sûryê, kultura û sincî, rabûnrûniştin û danûstandin, tevger û xebat, pakî û dilsozî û hemî war û karûbarên jiyana mirovê Kurd,, ew hemî ji me re şahid û nêrevan in, ku em li Sûryê -wek gel, civak û kes jî- em ji erk û stubariyên xwe re beşekî dilsoz in; loma jî em, ji dîroka xwe û ji mafdariya mafên xwe piştrast in, û fedî nakin, û vir û gotinên mîna hindikirina hejmara Kurdan û gotinên din yên pîs jî, ciyê tinazî û henekan e, û tenê sazûman û rikber xwe pê riswa dikin û dibin ciyê tinaziyê.

Lê li vir, û li derbarê rikberiyê û sazûmanê jî, pirsa giring ev e: Eger sazûmana Bais, bi nêrîn, raman, helwest û kiryarên xwe yên nijadperest, li dirêjiya pêncî salî baş hatiye naskirin, û ew nikane ji sepeta nijadperestiya teng derkeve, ew tiştekî ne seyre! Lê gava ku helwest, sixêf û derew ji kesên ku xwe (şoreşger) dibînin, û wek nûnerên (şoreşa gelê Sûryê) xwe didin nasîn dertên, ew kes û alî dibin ciyê guman û mixabinyeke mezin, û ciyê hezar pirsên îjdil jî! Wê lomê, em bi bawer in, ku çi helwestên bê pîvan, û bêhina jijadperestiyê jê tê, ku ji berpirsên rikberiyê û sazûmanê jî dertên, ew ne tenê ji encama raman û çanda Be`is ya kufkî ne, baweriya tekûz ew e, ku destên dewletên ku neyarên Kurdan jî di paş de hene.

Em dibînin, tenê sê tişt kanin helwestên vir, sixêf û nijaperestiyê ji me re rave bikin, ew jî:

**Yek**: Piraniya kesên ku roja îro bûne rikeber, û serkêşiya saziyên wê yên siyasî û diplomasî dikin, ji pêsîra Nijadperestiyê mêtine û bi ramanê Partiya Be`is mezin bûne, lewre jî, mîna kûpiyekê ku ji koka xwe qirêjtir xuya dibin! Eger berpirsên sazûmanê gotinên xwe - yên xerab û nîvxerab jî- bi pîvan û bi siyaset dikin, lê peyayên rikberiyê, helwestên xwe yên siyasî yên kevnerêç û regezperest, rût û tazî dibêjin, û hîç naxwazin hebûna gelê Kurd li Sûryê binasin. Ev jî ji paşeroja Sûryê re tiştekî pir buve û xerab e.

**Didu**: Rikberiya siyasî, nemaze ewa ku rayedarên wê li Stembûlê rûdinin, dîlên berjewendiyên rayedarên Anqerê ne, û li ser daxwaza destlata Tirkiyê, û li gora dilxwaziyên wê helwestan digirin. Ev jî rastiyek e, roj bi roj diyartir dibe, û kesek nikane înkar bike.

Rast e, ku gotin û helwestên regezperest û şovenîstan li dilê her Kurdekî dikevin û wan birîndar dikin; lê li aliyê din, eger pariyek namûs bi wan şovenîstan re mabe, û dixwazin bi cilên (şoreşgerî û demokrasiyê) xwe li pêş raya cîhanî fodil bikin, ew bi wan nêrîn û helwestan xwe yên rût û beloq xwe pir erzan dikin, rastiya xwe ya virek û nijaperst aşkere dikin, û şovenîstiya xwe jî, zelal û vekirî didin nasîn. Li aliyê din jî, doza gelê Kurd di azadî, demokrartî û wekheviyê de, li ba raya cîhanî ya giştî, berz, bilind û mafdartir dibe.

**Fedralî Çareya … Dûmahîk**

Gava şoreş bû çekdarî, ew neçar bûn ku li piştgir û alîgiran bigerin, dewletên piştgir jî li gor merc û berjewendên xwe ew bi çek kirin. Di vê têkiliya ne durust de, rikberên çekdar biryara xwe ya niştimanî ji dest dan, û di destên wan de bûn kevirên ştrencê. Li rex wê, rijîmê wiha xebitî, û wê jî alikarî ji derve wergirt. Di vê çarçewê de her du aliyan, tundrewên cîhanê li xwe kom kirin û Sûriyê bû qulba teroristên cîhanê, û herwiha du hêzên terorist ên mezin bi holê ketin " Daiş û Nusre" .

Di vî şerê tewşankî de, gelê sûrî buhayeke giran da, û hîn jî dide. Xaniyên wî hilweşîn, mewalên(emlek) xwe winda bûn, li ser sînoran hatin kuştin, di deriyan de fetisîn û li seranserî cîhanê goçber bû...

Li dema dawî rijîm pir lawz bû, bi wê re, berjewendiya Rûsan jî ketin buvehiyê, û gava wiha pê hay bû, ew bi hêza xwe ya pêşketî derbas Sûriyê bû, daku piştgirya rijîmê bike, berjewendiya xwe biparêze û destên Îranê û Tirkiyê jî di qeyranê de lawaz bike. Wê li ser zemînê, hin destkewt pêk anîn, çi di warê leşkerî de, û çi diwarê rêzanî de. Di paş perdê re jî, Mosko û Waşintunê kanîn bi şêwekî li hev bikirana, berhemê wê lihevkirinê jî ew bû, ku pirojeya Cinfê berdewam bibe.

Di van salên şoreşê de, Kurd jî di hemî waran de beşdar bûn, û li vê kenarê û li wê kenara şoreşê belav bûn. Û li rexê din, bandora hêzên kurdistanî jî li ser tevgera Kurd giran bû, hukariya wan li ser hin partiyan çêbû, û wê yekê jî rewşek ne xwezayî di nav gelê Kurd de li Rojavayê Kurdistanê çêkir. Ango berhema wê piştgiriya newekhev ji hêzên siyasî re, perçekirina Kurdan zêde kir.

Roja îro sê çarçewên siyasî çêbûne ``ENKS, Hevbendî û TVDM``, û lihvekrinên di navbera Kurdan de îmze bû bûn jî, hatin herifandin, û li ber roniya wê yekê, hevpeymanên Hewlêr û Dihokê, Desteya Bilind û Lêvegera Rêzanî hatin beravêtin. Ev yek ji têkliyên kurdistanî yên ne durust hatine, û ji ber ku biryara Kurdên Sûryê jî ne di destê wan de ye.

Ji ber vê tentêla(rewşê) linehevkirî, guftûgo di navbera rijîmê û rikberiyê de li Cinêvê dibin, bê ku tevahiya Kurdan tevle pirogramê bibin û taybetiya xwe lê diyar bikin. Ango, aliyên dijber û sazûman jî, îro li Cinêvê rûdinin û mafê ji Kurdan re erê nakin û wî tune dikin .

Hêzên kurdî pirojeya fedraliya Rojava-Bakurê Sûriyê ragihandin, tu kes ji hêla Kurdan de li dijî wê derneket û piştgiriya wê hat kirin. Ango Kurd di warê daxwazê de bûne yek, ev jî gavek li pêş e. Lê wek tê xuyan, ew dewletên ku naxwazin Kurd bibin xwedî maf, li rikberiyê dane zorê daku pirojeya federaliyê nepejrînin.

Piştî evqas sal ji kar, xebat, xwîn û wêrankirinê, hîn jî rijîm û rikberiya nedmokrat û mafxwer li serê xwe siwar bûne, û nasnekirine ku dermanê nexweşiyên Sûriyê di yekîtiya fedrale de ye, û sûriyê dê bi wê li ser xwe bimîne û bi ewleyî bijî.

Ji hêla Kurdan de, ta ku xwedî li fedraliya xwe derkevin, û ciyê rast bigirin, pir kar ji tevgera siyasî û milet tê xwastin, yên sereke ev in:

1- Hemî pêkhateyên netewa Kurd li Rojavayê Kurdistanê, di ser hemî nakokiyên ku di navbera wan de hene re gav bikin û çareser bikin.

2- Nûnertiyeke hevbeş ji guftûgoya Cinêvê re were vebjartin.

3- Ji hemî hêzên Kurdistanî tê xwastin, ku taybetiya doza Kurd li Sûryê were rêzgirtin, û pişgiriya erênî jê re were kirin.

**Kiryarên hovane .. Dûmahîk**

dikin, ev operesyon jî ji mezintirîn metirsiyan e, ji ber ku ziyanên wê pir in û di cihên giştî de têne kirin, ji bilî ziyanên madî ku peyda dikin, gelek kesên sivîl jî dibin qurbanî, ji ber ku ew tu cudahiyê di navbera zarok, jin, mêr, kal û pîran de nakin, û kesê bi vî karî radibe jî, çavên wî ji rastiyan hatiye girtin û di bin bandora durişmên olî yên derew, û gihiştina buhiştеke xeyalî de dimîne.

Lewra, gerek e em ji bo herêmên xwe hişyar bin, tevger û tiştên nenormal bişopînin, bi desteyên rêvebir û parastinê re alîkar û piştgir bin, û wî karî wek erkeke netewî li ser milê xwe bibînin. Çinkî, ev xaka ku em li ser dijîn a me hemiyan e, divê em hemû jê re parêzvan bin, pêbawerî û welathez bin, li hember dijminên mirovahiyê pêdar bin, kanibin xwe û welatê xwe biparêzin, û di jiyaneke aştiyane û ewle de bijîn.

# Hîn Berge Heye ku …. Em Bibin Yek!

**Merwan Berekat**

Şer û pevçûnên me, nakokî û lihevnekirina me û ta dijîtiya me ya dîrokî jî tiştek e, lê lihevkirin û hevbendiya me li hember van (qurbetan) -yanê Kurdan -divê li cihê xwe bimîne û me hajî hev hebe!. Ev biryar û baweriya dijmin û xêrnexwezên gelê Kurd in, û ew vê biryarê cîbicî dikin.

Bêguman siyasetmedar, rewşenbîr û ta cotkar û şivanên Kurd jî vê yekê zanin, ji ber ku, di dîroka gelê Kurd a nûjen de, bi deh caran dijminên me, bi hevpeymanên nava xwe, komkujî û talankirin di dermafê gelê Kurd de kirine, û hîn jî di vî karê xwe yê qirêj û nemirovane de berdewam in.

Ev bûne pênc sal, ku şerekî navxweyî li Sûriyê berdewam e. Vî şerî bandora xwe li têkilî, hevpeyman û dostaniya di navbera dewletên Rojhilata Navîn, nemaze jî yên ku bi Sûriyê re hevsînor in kiriye. Di navbera hinan de gîhaye asta dijîtiyê, nemaze di navbera Tirkiyê û rêjîma Elbe`s de, û her weha di navbera Tirkiyê û Îranê de jî têkilî lawaz bûne.

Li aliyekî din, rikbera Sûrî bi şêwakî piratîkî şerê Îranê dike, ji ber ku Îran bi hemû kanîna xwe, piştgiriya rêjîma Sûrî dike, û ew di nava şerê Sûriyê yê navxweyî de beşdar e.

Û her weha destê Tirkiyê û hin dewletên Kendava Erebî jî, di vî şerî de heye. Lê dema ku Kurdan pirojeya fidralîzmê li Rojavayê Kurdistanê ragahand, bê ku ew alî û dewlet li hev rûnin, û kongir û rêweresman li




dar xînin, hemû di şerê li hember pirojeya Kurdan de bûn yek.

Li vir, pirsa mezin û bê bersiv ev e: Çima serkirdeyên tevgera Kurdî naxwazin nameya xêrnexwaz û dijminên doza kurdî wek heye bixwînin?! Ma gelo sedem çi ne, ku nakokî pir dibin û hewildanên şer û dijîtiyê di navbera partiyên Kurdî de gur dibin?!

Roja îro, doza kurdî li Rojavayê Kurdistanê di firkeke zor nazik û hestewar de ye, û yên ku bi roj û şev û bê rawestan ji bo têkçûna destkeftiyên gelê Kurd kar dikin, ew pir dibin, û bi hemû awayan şerê Kurdan dikin. Mixabin û sed carî mixabin! lihevnekirin û neyekrêziya tevgera siyasî ya kurdî li Rojavayê Kurdistanê karê neyaran hêsan dikin, û derfetên serkeftina doza Kurdî jî kêm dikin.

Ezîtî û berjewendiya partiyan, ne jî xwegirêdana bi sozên derewîn ên neyarên Kurdan ve, tucarî nakevin xizmeta berjewendî û serkeftina doza Kurdî. Hîn berge heye ku her aliyek ji aliyên tevgera kurdî li xwe vegere û hewildanên hevpejrandina hev bikin, çinkî ji bilî wê çare nîne!. Belê, eger robar bibin yekçem, Kendal û bendên ji qûmê pêlên wî ranawestînin, û kaniyên biçûk jî zeviyên mezin û fireh avnadin.

# Kiryarên Hovane

**Nazdar Hesen**

Wek em dibînin, kiryarên hovane ji aliyê rêxistinên terorîst de -çi Daiş, Cebihet El Nusra û bilî wan jî- li ser herêmên kurdî dibin û didomin. Niha, nîştecihên sivîl jî ji hêla leşkerên komara Tirkiyê de tên binçavkirin, îşkencekirin, kuştin û gund û herêmên kurdî têne dorpêçkirin û topbarankirin.

Ew neyarên hov bi van kiryarên ne mirovane hewil didin, ku vîndariya gelê Kurd lawaz û pûç bikin. Lê piştî têkçûna wan li hember lehengiya şervanên Kurd (YPG,YPJ, Pêşmerge), nemaze li Kobanê û Şengalê, dest bi operesyonên mezin û berfereh kirin, êrîşeke tund û tûj li dijî gel, malûmewalên wan kirin, heya kela kîndariya xwe li ser darên zeytûnê rijandin, û bi sedan darên zêtûnê ji kokan de hilkirin.

Niha Jî, dest bi teqînên xwekujî ….. ❸

# Dr. Pêşeng …. Kurdê Herî Serkeftî li Brêtaniya

Bi boneya cejna Newrozê, bijîşkê Kurd Dr. Pêşeng Ebdilhenan weke Kurdekî herî sekeftî di warên (bijîşkî, civakî, mûzîkî û h.w.d) dihate xelatkirin. Xelat her sal ji hêla (Navenda Pêşketinê ya Kurdî) de li baregeha perlemana Brêtaniya tê dayîn. Di wê boneyê de, serokê Partiya Karkiran a Brêtanî Rê.Cêrêmî Kobrên û gelek perlementêr û siyasetmedar jî beşdar bûn.

Pêşeng li sala 1998an pileya yekem li seranserî Sûryê di ezmûna Bekeloriya/lîse de bi dest xisti bû, û li zanîngeha Helebê li kolîca Bijîşkiyê dest bi xwendina xwe kir, û li sala 2004an jê derçû. Piştre, ji bo berdewamkirina xwendina xwe, berê xwe da Brêtanya û ew niha li Bakurê Îngiltera di warê neştergeriya rûvî û pençejanê de şarezahiyê اختصاص dike, û ew di karê xwe de pir serkeftî ye.

Dr. Pêşeng di maleke xwende, rewşenbîr û niştimanperewer de mezin bûye, belkî ji ber wê be jî, ew jî bi welat, ziman û pirsên gelê xwe yê Kurd re pir bendewar e, û di ber xwendina xwe re, ji bo wan bi dilsozî dixebite.

Dr. Pêşeng ji xelkê Rojavayê Kurdistanê ji navça Efrînê ye.

Bêguman, em bi Dr. Pêşeng û her mirovekî me yî serkeftî serbilind in, [ hêvîdar in, ku hemî keç û xortên me, ewên ku berê xwe dane derveyî welêt, şopa



kesên mîna Dr.Pêşeng û riya serkeftinê bigirin, daku gelê xwe re hêviyên mezin û rastîn pêk wînin. Serkeftina Dr. pêşeng li wî, me, malbata wî û hemû gelê Kurd pîroz be!.

---

### Gundê Şêtika … Dûmahîl

Gund ji aliyê rêvebirî, û li gor dabeşkirina dewletê, bi qeza Çilaxa ve girêdayî ye, lê li gor dabeşkirina Rêvebiriya Xweser, bi Qeza Tirbespiyê ve hatiye girêdan. Ggundê Şêtika (24)kman ji Çilaxa û Tirbespiyê dûr e, herweha (3)km-an ji sînorê Turkyê dûr e. Sînorên wê yên xaknîgarî: Ji rojava ve: Gundê Dêrûna Qulonga, ji başûr ve: Gundê Elî Bedran û Babasî, ji bakur ve jî gundê Etbê û sînorê Turkyê, û ji rojhilata gund de jî, Xirabê Reş, Dêrûna Axê û gundê Qaşto ye.

Dema ku gundê Şêtika hate damezrandin, bîst malbat di damzrandinê de pişkdar bûn, lê hozên ku niha li gund hene ev in: Basiqla, Hemeka û Seyid in, û hin hozên din jî lê cîwar bûne. Berî qeyrana Sûriyê ya 2011an dest pê bike, hejmara xaniyên gund /43-44/ bûn, û serjimara şêniyên wê ya niha dora 400 kesî ye.

Gelek Kanî li Rojhilata gundê Şêtika hene, ji wan (Kaniya Kera), ji ber ku çêriya Keran li dora wê dibû, (Kaniya Mewîjan), ew jî ji ber ku gundiyan Mewîj li qiraxa Kaniyê çêdikirin, û (Kaniya Hesen) li ser navê Hesen ku kanî kolaye. Li başûrê gund û bi aliyê gundê (Elî Bedranê) de, (Kaniya Hêştir) jî heye. Çemek jî di başûrî gund re diherikî û di rojhilatî gund re derbas dibû, lê ew di salên dawîn de ziwa bûye, ew ji giyayê Birdî û Çîtikê re şîngeh bû. Û ji bilî wan gelek navê xaknîgarî li derodra gund hene, û ji serdema bav û kalan de mane, loma jî bihna mirov bi wan derdikeve û fireh dibe.

Ji hêla xizmetguzariyê de, dibistaneke sertayî û tora telefûnê li gund heye.

Rûbera xaka çandiniyê li gundê Şêtika (700) donim in, bi sedema serastikirina sînor di navbera Turkyê û Sûryê de, /250î/ donim jê hate parçekirin, û li Erebên Xmrê hatin belavkirin, lê xaka sûdewergir الانتفاع ku hikûmetê kirêya wê distîne, dora (1000) donimî ..6

# Dayîk.. Kaniya Mirovatiyê ye

Îlham Osman

Çavên min di hembêza wê de vebûn… bi qêrîna yekem re hestên banok dorpêç kirim... di dergûşa evîna xwe de hejandim... şev û roj, dilop bi dilop, bi lorîkên zîz mezin kirim... ta hîma perwerdeya min bi kurdî nîgar kir. Dayê: Rast e, bûme dê, lê hîn dengê nazik di giyana min de xweş awazan saz dike, û her tim peyv û şîretên te di dilê min de avahiya eşqa welêt, qat bi qat ava dike... bila tu zanibî, ta mirinê çavên min dê riya dîtina te bipîve. Pir caran hestên biyanî û bi êş di kurahiya derûna min de pal vedidin, û carina li hemberî bûyerên jiyanê jar dibim û dikevim terezoya biriyarên dijwar, wê hîngê tenê hembêza te dibe cîwarê hêviyên min ...

Dayîk diyariya xwedê ye, evîna rasteqîn e, ew bê berjwandî sedema afrandin û domdariya jiyanê ye... lewre, eger carina bi hêrs dibe... zanibe ku metirsî dilê wê diguvêje, yan carina rûyê xwe tehl dike û berê xwe diguhêre, zanibe ku we ji riyên quloç û pir firk diparêze, yan jî eger carina dixeyide, zanibe ku bîra bejn û balava zaroyên xwe kiriye..... zaroktiya xwe bînin bîra xwe.... kî ji we turkên rojên xwe ji çîrokên bi coş tijî nekirine... kê bi lorîkên xweş xwenên gulane mezin nekirine!!! Kî dikare li mafê wê mukur dernekeve... wê tundiya dem û mirovan bi aramî daqurtandiye!! Diya Kurd… xwediya rewşenbîrên bi navûdeng, xwendekarên pêşerojê û pakrewanên nemir e. Ji bîr mekin, di saya wê de, hîn girêdana me bi ziman, xak, dîrok û çanda kurdî de maye, Xweda bi xwedatiya xwe bihuşt xistiye bin lingên dayîkan, gelo ma tu gotin dimînin ta ku em nirxê bilind nedine wê, û ji qurbankarî û evîna wê re nimêj nekin?!!



**Gundê Şêtika … Dûmahîl** ye, ew jî di navbera Erebên Xemrê û cotkarên gundine din de hatine belavkirin.

Şêniyên gundê Şêtika (Birinc, Garis, Ceh û Genim) diçandin, rezên Tirî jî pir bûn, lê ji encama salên kêmbaran, îdî niha tene, Gijnij[(Kizbera)] û Kemûnê diçînin.

Ji hêla sewalvaniyê ve jî, pez û dewar lê dihatin xwedîkirin, mîna hesp, hêstir, mih, çêlek, bizin û gamêş.

Ji aliyê olî de, hemî xelkê gund li ser ola Îslamê ne, pîrizgeha mêrava Mela Remezan jî di nava gund de ye.

Gundê Şêtika bi niştimanpewweriya xwe navdar e, gelek kesayetiyên welaparêz di gund de hebûn û hîn jî hene, û ew di têkoşîn û xebatê de xwedî dîroka dirêj in, ji ber wê yekê, gelek zor û setem ji destê rijêma Sûriyê dîtiye, û ji kiryarên awarte bê par nemaye, ta vê rojê jî, hîn hin kes bê nasname (Mektûm) mane.



*Bi kurtî ji: Rûpela Çarçira.*

**Wergerandin ji Erebî: Elend Mihemed.**

# Heştê Avdarê ROJA PÎROZ

**Vejîna Kurd**

Li sala 1957an, Netewên Yekbûyî roja 8ê Adarê weke Roja Cîhanî ya Jinên kedkar destnîşan kir, û ev roja bû nameya berdewamiya xebatê ji bo bicîkirina wekheviya mêr û jinan, û teqezkirina hemû mafên mirovatiyê yên ku ji sed salan de jin jê bêpar mane… Di vê rojê de, li hemû dewletên cîhanê, aheng tên lidarxistin, jin tên pîrozkirin û li ser doza wê ya pîroz tê axaftin.

Lê divê em vê pirsê bikin: Gelo! destnîşankirina rojekê ji jinê re, tê wateya ku jinê hemû mafên xwe bi dest xwe ve anîne?!! Yan jî ew kesayetiyeke serbixwe ye?!! Bêguman na.. Îro di sedsala bîst û yekê de, li pir deveran, bi şêweyên aşkere yan veşartî, zordarî li dijî jinan tê kirin, û li mafên wan yên rewa netê mikûrhatin, nimûne jî pir û pir in, û di nav hemû pêkhateyên civakê de tên dîtin..

Tiştê balkêş ew e, ku êşekên hemû jinan li ser xaknîgariyeke mezin û fere ji çavkaniyekê diherikin, ew jî hişdariya civakê ya şûndemayî û ya ku mêr serweriya wê dike ye.. Ji ber vê rastiyê, pêwîst e ku hemû kelemên civakî û pirsgirêkên çanda kevneperest ji pêşiya jinê bên rakirin, û xebatek berfere di vî warî de were kirin.. Ev jî berî her kesî stubariya jinê ye, û herweha tekoşînên hişmend û îjidil ji wê tên xwestin. Pêwîst e ew wateya azadiya rasteqîn binase, bi bîrûbawerî û zanînê rola xwe di hemû warên civakê yên aborî, civakî, çandî û siyasî de bilîze. Divê jin hêz û helwestên xwe hilde asta rewşenbîrî û hişyariyê, û bi erkên xwe yên dîrokî rabe, û herweha berevaniya hebûn, azadî û mirovatiya xwe bike.

Belê… Destkeftinên wisa rêzgirtinekê ji kesayetiya wê re peyda dikin û riyên çareseriya doza wê derdixin holê. Îro cihê rêzgirtin û serbilindiyê ye, ku jin, nemaze jina Kurd, bi hemû hêz û vîna xwe beşdarî xebata azadiyê dibe, û hemû nêrîn û ramanên ku jin wek regezeke aloz di civakê de destnîşan dikir, li zemînê dixe, roj bi roj ew berxwedanên curbecur derbasî qadên xebata xwe dike, gavine pîroz berve serkeftinê davêje, û li doza xwe ya rewa xwedî derdikeve.

# S.F.P.Z.K û Pirsa Perwerde û Fêrkirinê

Piştî bikaranîna zimanê kurdî di her şeş polên seretayî de li her sê kantonên kurdî (Cezîr- Kobanê- Efrîn) li Sûryê, gotin û gengeşe li ser ziman û naveroka pirtûkên rêbaza hînkirinê çêbûn, û bergeheke ji raghandina kurdî stand, û bû warekî nû jî ji nakokiyên kurdî-kurdî re li rojava.

Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê ku li Buhara /2006/an hatiye damezrandin, li dirêjiya salan, û di siya heyam û mercên ewlehî yên zor û zehmet de, xebateke bêdudilî li seranserî herêmên kurdî li Sûryê û li deverên ku kurd lê dijîn jî kir, û herdem xebitiye ku zimanê kurdî bigihê astên bilintir, û di nava zimanên cîhanî de jîndar bimîne, û wê kanîbû bi keda kadroyên xwe, bêtirî deh hezar keç û xortên gelê me fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin, û kanîbû jî, bêtirî deh hezar hejmar ji pirtûkên zimanê kurdî çap û belav bike. Û ji ber xebata xwe ya dirêj û berdewam, gelek endamên wê hatin binçavkirin û rastî îşkence û zîdanên rijîma Sûriyê jî hatin.

Ji bo parastina zimanê dê, û berpirsiyariya wê ya dîrokî di ber pêşeroja nifşên nû de, Saziyê dît, ku pêdivî bi lêveger û nirxandina pirtûkîn rêbaza ku li dibistana tên xwendin heye. Ji bo wê yekê, Saziyê komîtak ji mamosteyên xwe bi nav kir, û bi xwendin û nirxandina ziman û naveroka pirtûkên rêbazê stubar kir. Piştî ku komîtê pirtûkên rêbazan tîp bi tîp xwendin, wê têbînê xwe kom kirin, bi hin mamosteyên zimanê Îngilîzî, Firensî û Erebî şêwirîn, û hemî têbînên ku li ser li hev kirin erşivandin û belge kirin.

Piştî wê, komîtê baş dît, ku wan têbînan û çareserkirina wan, di riya namakê re ji berpisên Rêvebiriya Xweser re pêşniyar bike, pêşniyar jî ev bûn:

*1-Komîta S.F.P.Z.K.s , pêşniyar dike, ku korek* مَجْمَعْ *yan komîtek ji bo karûbarên zimên di siha zanîngeha EFRÎNÊ de were avakirin, ji erk û stubariyên wê be, ku lêvegereke giştî li zimanê pirtûkan bike, û li gora encamên wê çapeke nû ji wan re were kirin.*

*2-Di warê perwerdeya civakî, siyasî û niştîmanî de, vegereke zanistî li naveroka pirtûkan were kirin. Ew jî ji hêla şarezane ji kurdên ROJAVA û li gora pergalên şaristaniya nûjen û nirx û taybetiyên civaka kurdî were kirin.*

*3- Hevsengî û hevpîan di navbera temenê şagirt û zanînên ku di pirtûnkan hatine de hebe, û di navbera pirtûkên refan bi xwe de jî were durustkirin, …….*

8

# Bîranîna Helbestvanê Gewre …. Seydayê Tîrêj



Roja 23 miha Avdarê, salvegera 14an ya goçkirina helbestvanê Kurd ê binavûdeng Seydayê Tîrêj bû. Seydayê Tîrêj (Nayifê Hesen) li sala 1923an li gundê Nicme ji gundewarê Hisîçke ji dayîk bûye, û li sala 2002an jî çûye ser qedera xwe.

Seydayê Tirêj kurdperwerekî dilsoz bû, xem û hezkirina Kurd û Kurdistanê û zimanê kurdî herdem di dil û hişdariya wî de bû. Wê rastiyê, kenca xwe davête ser hemî warên jiyana wî, û dikir ku ji destpêka jiyana xwe de, tevle refên kesayetiyên mîna Cegerxwîn, Qedrî Can, Hesen Hişyar û Nûridîn Zaza bibe, û ji ber mafên gelê Kurd, zimanê kurdî, helbesta kurdî û wêjeya kurdî de, ta dawiya jiyana xwe bixebite.

Seydayê Tîrêj di temenê xwe yê dirêj û dagirtî de, gelek berhemên wêjeyî li şûna xwe hiştin, û pê ziman, wêje, kelepûr û pirtûkxana kurdî jî dewlemend kir. Ji berhemên wî, çar dîwanên helbestê hatine çapkirin:

**1**.Xelat-1985. **2**. Zozan-1990. **3**. Cûdî-1998. **4**. Serpêhatiyên Kurdan(1)-1992. Ji berhemên wî yên çapnekirî jî:

1.Mûlîda Kurdmancî.

**2**. Dîwanek ji helbestan.

**3**. Serpêhatiyên Kurdan(2).

Seydayê tîrêj sê caran hatiye xelatkirin:

1. Li sala 1995an li Roja Helbesta Kurdî, li Efrînê-Kela Hûrî.

2. Xelata Sedsaliya Rojnamevaniya Kurdî-1998 - Erbil (Hewlêr).

3. Ji hêla Koma Helpçe ya Folklora Kurdî de li Hesekê-2001.

Me ji dîwana wî (Xelat) çend bendik ji xwendevana re vebjartin:

**Bîst û yekê Adarê**

*Bist û yekê Adarê, hezar carî bi xêr hat*

*Di dewrana biharê, Newroz û cejna welat*

*Agir li deşt û çiyan, pêtî jê diçin banî*

*Li çar goşê Kurdistan, dikî şewq û xuyanî*

*Ji bo me pir ziyan in, ev dubendî û eşîrî*

*Bi van rêçên xwar û mar, doza me naçe serî*

*Heta ku em nebin yek, nabe tu kar û xebat*

*Goga xwe em nabin şeg, azad nabe ev welat*

*Divê bi dilpaqijî, destê xw em bidin hev*

*Çi cotkar û çi karker, bi yek can û dil û dev*

**Ey Şehîd**

*Can fidayê gel, şehîdê welat*

*Em dikin pîroz, cejna te b`şewat*

*Ku te bi merdî, emrê xwe`y ciwan*

*Di riya milet, te daye qurban*

*Gora te wek, baxê buhîştê*

*Heval û hogir, tev tê tenîştê*

*Li dora te, dibin wek xelek*

*Hêstiran dirêjin, ji çavên belek*

*Tu canfîdayê, kar û xebat î*

*Hem tu kuştiyê, jîna welat î*

*Herdem di dil û di hinavê me*

*Tim sawêra te, li ber çavê me*

Şehîdên azadiyê zindî ne, sawêra Seydayê Tîrêj jî li ber çavê me ye, û ew herdem zindî ye.

---

**S.F.P.Z.K … Dûmahîk**

*ew jî bi riya kesên şarza dê were kirin. Ev pêşniyarina ji van aliyan re hatin şandin:*

1-Hevserokatiya Kantona EFRÎNÊ.

2-Zanîngeha EFRÎNÊ.

3-Desteya Perwerde û Fêrkirinê.

Sazî hêvîdar e, ku di cefayê xwe yê biçûk de ji bo zimanê kurdî û nifşên pêşerojê sûdar be, di heman demê de jî, di wextek nêzîk de bersiveke erênî wergire, û ew amade ye, ku li gor gengazî û kanînên xwe bi awakî erênî alîkar be.

Name bi nave Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê

S.F.P.Z.K.s, li Reşmeh/Şibata sala/2016/an hatiye şandin.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com